Li pişt perdeyê, çi li ser Kerkûkê dihê gotin!?

Amadekirin: Ehmed Miho Hecî

Li dawiya meha adara derbaz bûyî di kombûnek neasayî de ku ji bo madeyê 140 hatibû terxankirin û paş şazde demjimêrên rûniştinan giropê kurdî di civata wezîran de şiyan paş danûstanek têr û dijwar, civata wezîrên Îraqê neçar bikin ku bi pitiriya dengan biryarên lijneya madeya 140 pesend bikin û malikyê serorikwezîr jî giringiya xwe bixe ser, lê Nermîn Osman wezîra jîngehê di hikumeta Îraqê de û endama lijneya madeya 140 amaje bi wê yekê kir ku li 8/4 li civata wezîrên Îraqê name bo wezîran û endamên lijneya madeya 140-ê hatine arestekirin lê li dûmahiya wê nivîsînê careka din hatiye daxwazkirin ku bi cihanîna vê biryarê dibe paş pesendkirina serokatiya Îraqê û endamên perlemanî bihête kirin. Ev biryarên ku ta niho lijneya madeya 140-ê derxisitîn û civata wezîran biryar li ser dayî ev in: Vegerandina fermanberên derxistî û pûçkirina girêbestên çandinê û qerebokirina erebên hawirde û kurdên derxistî. Dîsan Nermîn Osman di gotina xwe de diyar kir û got: Di wê nivîsînê de hemû biryarên me careka din hatine nivîsandin, lê birgeyeka din lê hatiye zêdekirin ku tê de hatiye daxwazkirin ku hemû biryar bikevne berdestê desteka serokatiya komarê ku ji serokkomar û her du cêgirên wî pêk dihê û paşan dibe biryar bikevne ber destê perlemanî ji bo bihête pesendkirin sebaret vê yekê Nermîn Osman got:

"Ev xwe bi xwe coreke ji dirêjkirina karî û deynane astengane li hember bi cihanîna vê madeyê" sebaret vê çendê Dr. Berhem Salih di daxuyaniyekê de hêvîxwestin ku ev çend tenê şaşiyeka bê mebest be û zû bihê çareserikirin ji ber ku Salih bo diçe pêdivî bi pesend û razîbûna civata nûneran û civata serokatiyê nîne. Dîsan cêgirê serokê hikumetê û di dirêjiya daxuyanyên xwe de diyar kir ku madeya 140 li gel destûrê welatî kok û guncaye û mafekê destûriye ji bo çareserkirina kêşeya Kerkûkê û deverên din ku tûşî erebkirinê û guhorîna regezî bûne.

Ji aliyekî din ve heger ev biryar hatine nav perlemanî ji bo ku gengeşe li dor bihê kirin dûr nîne kêşeyên mezin ji bo lîsteya hevpeymaniya Kurdistanî bihête duristkirin çunku Turkman û erebên sune û rewtê Sedir û jimareyek ji hizba dewe jî dijî vê biryarê û madeya 140-ê û ji ber vê yekê jî birêz Fuwad Mesûm serokê lîsta hevpeymaniya Kurdistanê tekez dike ku hinartina vê biryarê bo perlemanî ku gengeşe li dor bihê kirin bi çi awayan nahê qebûlkirin.

Derbarey daxuyaniyên Nurî Elmalikî li dor hinartina van biryaran bo serokatiya Îraqê û perlemanî ji bo bihê pesendkirin, Fuwad Mesûm dibêje; "carê zûye niho axavtin li ser bihête kirin ji ber ku hê horikarên wê baş xuya nebûne, lê bi her halê hebe em wan karan ret bikin û li ser razî nebin".

Li ciyekî din û her derbareyî vî babetî Nermîn Osman diyar kir ku ev deverên ku ho bi germî bas li dor dihê kirin ne tenê deverên Kurdistanê ne, lê li başûrê Îraqê jî heman kêşe heye weku zongehan û çend devereken parêzgeha Kerbelayê jî.

Li aliyekî din û sebaret rol û dengê siyaseta Emerîka di vê pirsê de li van dawiyan wisa xuya dibe ku Emerîka bizavê dike hinekê guhorînan bixe pirosesa bicêkirina madeya 140-ê û dibêjin hikumeta Emerîka li gor wan rêkevtinên li gel serkirdatiya Kurdistanî berî pirosesa azadiya Îraqê mor kirin, dixwaze Kerkûk venegere ser herêma Kurdistanê û ji ber wê yekê jî ew qeza û nahiyeyên ji Kerkûkê hatine birîn li ser zemanê rijêma Sedamî û ta niho nehatine vegerandin bo parêzgeha Kerkûkê ku di binyat de rijêma Baas bi mebesta guhorîna dîmografyê ew kar encam dabûn, dibêjin bila ew jî her di rewşa xwe ya niho de bimînin.

Li van dawiyan ajansa nûçeyên Kurdistanê ji zardevê jêderekê agehdar belav kiribû, ku balyozê Emerîka li Îraqê ji bo

wê mebestê seradana birêz Mesûd Barzanî serokê herêma Kurdistanê kiribû û gotibû ku parêzgeha Kerkûkê û li gorey rêkevtinekê ku berî azadkirina Îraqê hatiye morkirin, Kerkûk dê bibe herêmek fedirala serbixwe û qeza û nahiyeyên ku rijêma Baas jê veqetandibûn nahêne vegerandin bo ser parêzgeha Kerkûkê. Dihête gotin ku her ji ber vê yekê Nurî Elmalikî serokwezîrên Îraqê ev biryar hinartiye perlemanê Îraqê û hindek çavdêr bo wê yekê jî diçin ku ji destkarkêşana Haşim Elşblî serokê komîteya bicihanîna madeya 140-ê û wezîrê dada Îraqê bo vê yekê vedigerînin. Li gor komîteya bi cihanîna vê madeyê pêdivîbû qûnaxa yekê ya asayîkirina Kerkûkê li 29-03-2007 bi dawî hatiba. Ango aware bo Kerkûkê hatiba vegerandin û hawirdeyên ereb jî yên li ser cihê wan hatibana vegerenadin lê ta roja îro jî çi pêngavên praktîk di vî warî de nehatine avêtin. Belku pitir di proseyeke xapandinê kar bi Kerkûkê û bi Kurdistaniyan re hatiye meşandin. Ji ber vê yekê Kurdistanî ketine bin barê gumanek mezin ku dor nîne madeya 140-ê nehê bi cîhkirin.

Ji aliyekî din ve sekirdeyên Îraqê berdewam ji cihên xwe daxryaniyan didin û daxwazê ji serkirdeyên kurd dikin ku girêdayî wan îmzayan bibin yên ku wan bi xwe îmza kirin û heta hindek çavdêr daxuyannyên nerm yên serokwezîrê Tirkiya Receb Teyîb Erdogan jî yên ku berî çend heyamekan derbarey Kerkûk bi awayekî hêmin û nerm anîn ziman her bi vê çendê ve girê didin. Angoya vê yekê û helwîstê nîzîkî hev yê serkirdeyên Îraqê û Turkiya belku wê yekê xuya dikin ku beriya niho bername hatiye duristkirin ku parêzgeha Kerkûkê venegire ser herêma Kurdistanê û bibe fediraliyeka serbixwe.

Li vê derê û her weka Nermîn Osman Wezîra jîngehê hikumeta Îraqê li ciyekî din jî li ser vî babetî radewiste û amajeyê pê dike û dibêje: "pêdiviye li ser astekî bilindtir ev doz bihê yeklakirin" ev gotin jî her weku amajeyekêye bo serok Barzanî û serok Talebanî ku xwe bi xwe û bi awayekî rasterast li ser kêşeyê û dozê rabiwestin. Çunku heger ev kêşeye nehê yeklakirin û akinciyên parêzgehê bi xwe biryarê li ser çarenivîsê xwe nedin, ne kêşeyên nava Îraqê dihêne çareserikirin û ne jî ew stema ku bo demê 85 salan li ser gelê kurd hebuye dihê rakirin.